



Mele Bateyî'nin Mevlidi

Murat Işık

Millî Eğitim Bakanlığı Eğitim Yöneticisi

muratisik34@hotmail.com, ORCID:0000-0001-0075-7122

Özet

Arapça yazılmış mevlidlerden başka, Farsça, Arnavutça, Kürtçe, Cava dilinde, Boşnakça, Rumca, Çerkesçe, Urdu dilinde, Sevâhilî dilinde ve Tatarca yazılmış mevlidler de vardır. İran edebiyatında, belki de Şî'îlik etkisiyle olsa gerek, mevlid türüne pek itibar edilmemiştir. Hz. Peygamber'in doğumu münâsebetiyle yapılan merâsimlerin ilki, X.-XI. yüzyıllarda, Fâtımîler devrinde (910-1171) yapılmıştır. Bu merasime halk değil, sadece hükümdar ve saray erkânı katılırdı. Herkesin ortaklaşa katıldığı mevlid merasiminin ilk olarak 1207 tarihinde Erbil'de Selçuklu Atabek'i Ebû Sa'îd Muzafferüddîn Gökbörü (ö. 1233) zamanında olduğu görülmektedir. Bu mevlid merasimi, daha sonra yapılan mevlid merâsimlerinin başlangıcı olarak kabul edilmektedir.

Anahtar Kelimeler: Melaye Bateyi, Hz. Peygamber, Doğum günü

Mawlid of Mele Bateyî

Summary

Apart from the mawlid written in Arabic, there are also mawlid written in Persian, Albanian, Kurdish, Javanese, Bosnian, Greek, Circassian, Urdu, Sevahili and Tatar. In Iranian literature, perhaps due to the influence of Shi'ism, the type of mawlid was not respected much. Hz. The first of the ceremonies held on the occasion of the birth of the Prophet, X.-XI. It was built during the

Fatimids (910-1171) centuries. Only the ruler and courtiers attended this ceremony, not the public. It is seen that the mawlid ceremony, in which everyone attended jointly, first took place in Erbil in 1207, during the time of Seljuk Atabek Abu Sa'îd Muzafferüddin Gökbörü (d. 1233). This mawlid ceremony is accepted as the beginning of the mawlid ceremonies held later.

Keywords: Melaye Batatei, Hz. Prophet, birthday

Mewlûdê Melayê Bateyî

Kurte

Di edebiyata faris de dibe bandora şia hebe ji bo wî jî cûreyê mewlûd nehatîyeîtî barkirin. bi minasebeta jidayîkbûna Hz. Pêxember ve lidarxistina merasîmên ye herî yekem di sedsalên 10 u 11 de ji alî devleta Fatimîyan ve hatiye lidarxistin. Ji vî merasîmê de xeynê gel tenê hukûmdar û efradê qesrê beşdar dibûn. Di sala 1207 de di hewler de ji alî melîkê Selçuklî Ebû Saîd Muzafferüddîn Gokborî ve merasîmên mewlûd yekemcar Yê beşdara bi tevahi hatiye damezrandin. Vî merasîmên mewlûd yê mewlûdê ji dawîya xwe re destpêk hatîye qebûlkin.

Bêjeyên Sereke: Melayê Bateyî, Hz. Pêxember, Jidayîkbûn

Destpêk

Lêraneda demanewêt be kurtî basî edebiyatêk bikeyn ke ilakeyêkî zorî heye legel edebiyati dinya, we be taybetî edebiyati arî. Nextêk le hendê edebiyati rojava deqat, we hendê lêy cuda debêt, ewiştir edebiyati kurdî ye.

Herwekî tarîxî kurdan be nezanrawî mawetewe we hêştê betewawetî le lay tarîx zanekan nezanrawe, edebiyati kurdîş bew çeşne malûm niye we malûm nebûwe.

Herwekû ême betewawetî ew şitane nazanîn ke tasîrî kirdiwete ser kurdan, we tarîxî kurdan herweha ew şitane nazanîn ke tasîrî kirdiwete ser edebiyati kurdî, inca ew şitane aya siyasî bê, komelî (civakî) bê yan dînî.

Mele Bateyî'nin Mevlidi

Hemisan çûnke kewmî kurd tuşî lafawî gelanu kewman bûwe, we kewmanî cuda cuda hemû exlakî, edebî, komelî (civakî) tasîr yan kirdiwete ser yan, zimanişyan tasîrî lêyan kirdiwe.

Ew milete bêganane ke hatûnete Kurdistan we em wîlatelyan dagîr kirdiwe, kemu zor tasîryan lêyan kirdiwe we ştekyan becê hêştiwe, we beşi kurdeyn ke kewtûwete ber em lafawane lejêr tasîrî dînu zimanu tabiyatu ehwalî komelî ewane mawtewe.

We çûnke kewmî kurd nezan bûwe, we medeniyetî ew milletane zor bûwe, destiyan kirdiwete werkirdini medeniyet lêyan. Inca legel medeniyet, şitî dîkeşyan werdegird. Wekû: Ziman, edebiyat, helbest, ehwalî, komelî.

Leber ew şitane ke le serewe gotman kurdekan hetakû êstake le zimanî xoyan ziyatir, le edebiyati zimananî bêgane têdekoşîn. Her be boney ewewe kurdekan bo edebiyati kurdî tênekoşiwne, we edebiyati kurdî -eweyke heye- herwa be nezanrawî mawete we.

Hemû xwêndewaranî Hawarî xoşewîst dezanîn ko gelî kurd qelêkî arî ye, yanî hindî-ewrûpî ye.

Leber ewe zimani kurdî we edebiyati kurdîş wekû zimanan û edebiyatanî dîkey arî ye, we edebiyati kurdî le edebiyati farsî, hindî, yonanî kon, rûsî, frensizî, elemanî... zor deqat. Inca bo ewe ke em heqîqete çak têbigeyn, ba hendêk basî edebiyatu çeşnanî bikeyn.

Edebiyat pêk hênanu gotinî mêşku fikrî insane be çeşnêkî ciwanu xoşu saf ke tasîr bikat le ser insan, aya insan xemkînu dilteng deqat, yan ferehnaqu dilxoşu keyfdar deqat.

Edebiyat ew şitaneye ke le dilî insan gird debêtewe we dêtû de we deçêt we derî deqate derewe, we deylêt be zimanêkî şirin û ciwan.

Inca edebiyat bêjînu gotinî hemû ştek niye, beşkû ibarete le gotînu bêjînî ştek ke bestirawe be (jiyan) ewe, we ke

pêwistî jiyane. Yekê le edebanî Misrî, gewre Abbas Mehmudî Ekrad gotiwyetî:

Jiyan çi ye we edebiyat çi ye.

Du şitîn le yek şit dururst kirawin we be yek dezê çênrawin we le yek karxane der çûne. Lemew pêş xelk pêynedewist ke boyan ispat biken ke edebiyat be bêjiyan pêk nayêt, belam êstake zor pêwistiyane ke boyan ispat bikrêt ke jiyane be bê edebiyat nabêt.

Legel eweşde ferqêk niye le beyanî em du heqîqete: Mebest herwekû her jiyane edebiyatêkî heye, hemû edebiyatêkiş jiyaneêkî heye, we her dukyan be yek çîşt de pêwrêt we berzî û nizmî dezanrêt.

Ey we xwa hîç jiyan be bê meylu cazibe debêt! We hîç meylu cazibeyêk be bê bêjîn û gotin pêkdêt!
We hîç kiseyêkî rastu ciwanu kincu jîkele dehête yek legel kiseyêkî naşirinu şêwaw û alozaw!

Cewabî em sualane hemû emeyeke jiyan be bê edebiyatek rêk nakewêt ke lêy biweşête we. We berzî û nizmî edebiyat herwekû jiyan be aynî şit depêwrêt.

Di Edebîyata Kurdî de Taybetiya Melayê Bateyî û Mewlûda wî

Mewlûda ku Melayê Bateyî nivîsandiye, ji ali Zeynelabidin Zinar ve hatiye tipguhaztin u Weşanxaneyê Firat ê ve di sala 1992'yan de, li Stenbolê hatiye çapandin. Li ser piştê wê çapê Mele Ehmedê Batê nivîsandî ye.

Ji alî taybetîya mewlûda melayê bateyî mirov dikare bêje ku Ev nezma, bi zimanê kurdî, bi tîpên Erebî bi wezna arûzê hatiye nivîsin û behsa Qasidê Pîroz, cenabê hz. pêxember dike û ji çend beşan ve pêk te.

Berhemên bateyî:

Bi qasî ku tê zanîn, ev berhemên wî hene:

Mewlûda Kurdî

Dîwana Bateyî

Destana Zembîlfiroş

Eve çend minak ji mewlûda Batê:

Hemdê bêhed bo xudayê alemîn

Wî Xudayî daye me dîne mibîn

Mele Bateyî'nin Mevlidi

Em kirîne imeta xeyrel beşer

Tabihî wî miqtedayê namwer

Wî xudayî malikê milkê ezîm

Daye me mîras qurana kerîm

Dinê me kir kamil û nî'met tamam

Ya'ni da me Ehmed û Darusselam

Ew Xwedayê bê nezîr û Zulcelal

Bê heval û bê misal û bê zewal

Bo cemihî mislimîn û salih

Bo feqîrê Bate jî el-fatîhe.”¹

Ew jî destana xwenaskirin e

Ey dil tu were bike temaşa

Ka tac û direfş û kanên ew şah

Ka şahîñşahê cîhan Ferîdûn

Îrec Menûçehrê tekye gerdûn

¹ <http://candname.hk-mg.net/2011/10/mela-hisene-bateyi.html>

Newzir ê bi dû de hatî zab e

Karê wî bi kêr ji bo me zab e

Kurapê wî Keyqubadê zordil

Ostiyax Durîstar e wê de bêdil

Keykawus û Xwusrewê nemek bûş

Navê wî di deftera de Kîyrûş

Luhrasibê ferzê wî riham bû

Qudsî ji nefîrê tar û mar bû

Kuştasibê dîn û ew li Zeraduşt

Behmen çû bi dû de dot Hamalîst

Darayê humay çî jêr debîr bû

Zerdeştkirina cîhan di bîr bû

Darayê duwem çî ejdeha bû

Kohîn û Muxîn ji ber Ruha bû

Darayê sêyem ku hat cîhan e

Ferxende nîhan bû Ariyane

Mele Bateyî'nin Mevlidi

Îskenderê hêk zi per ji ber dar
Belîş kêş dikirin ji bo milkê dar

Cengek li Kîlîkya yek li Erbîl
Dara di şerê duwem de bû dîl

Serdar bûn ji Nûh hetanî sêsed
Sih salî berî Mesîh di nav Med

Aşûr di rojhilat cîhangîr
Der şehrê ava de bûne bargîr

Alaya zerefş gihîşte Yûnan
Hind û Yemen û welatê Tûran

Ka Rostemê kurd û kanî Çopîn
Ka Nîlûferê egît û Gurgîn

Sultanê Belûc û Xorûsîstan
Sultanê Hirat Xezen û Efxan

Bapîr e ji wa re şerê Çopîn
Sultanê li wan ji nesla Gurgîn

Yezdiwabir û Yezûnûş û Tîrdad

Sih merwî weh bûne şahê Azad

Eywana bi nûd ji tac û gurzan

Dergûş e ji bo tilûd û dehban

Piştî ko Mesîh dibûye rehber

Sasanî li dû dibûne serwer

Roja ko Huseyn dibûye zava

Roj we di Belxê çûye ava

Sultanî Buweyh û hakimânên

Bedlîs û Hezo keranê wan in

Ev kesro yû keyanê kurd in

Doza me durust e pê xeberdîn

Tîrdadî ji kurê xwe nivîsand

Ew kurd ê kurê kurd ê azad

Şêrgohê ji kirina Azerbaycan

Şêrgoh e belê di fetha burcan

Mele Bateyî'nin Mevlidi

Yûsuf bi Selaheddînî navdar

Pirsa wî bike ji Flip û Rîşar

Ferzê wî eger ko fetha qisê

Çêkra bi zimanê kurdî Qudsê

Xelkê nedigotê Fatimî bû

Zanayî bikin ziman berî bû

Zanayê cîhan ha seranser

Pesnê wî didin bi xameya der

Pişt xatemê enbiya bi pênc sed

Şêst salî dibû melik xwedî bend

Hêşta jî evana heştê salî

Sultanî kirin bîla ubalî

Der Misr û Yemen Hîcaz û Sûrî

Bayezîd û welatê Şehrezorî

Heskîf melîkanê wê ji wan in

Şêrwî bi xwe ferzê wa Keran in

Merwanî û Amedî li ku man
Not salî di wê de mane Sultan

Mîrê di Cizîra şehre Botan
Kurdîti nema li dû Bedir-Xan

Sultanên bi navê Selîm û Qanûn
Baxê me li me kirine kanûn

Hêja bû ko xaniyê te Îdrîs
Zêr helbikira di şehre Bedlîs

Kurdmanç te kirine bazikê tirkan
Bûn bûkê rîman ciwanê Îran

Ey kom û civatên Ewrûpa ye
Dîlbûn bi vî terzî kê rewaye

Bulxar û Mecar û sayê Lubnan
Azadî dibin ji bil me kurdan

Wîlson li ku maye sozika te
Musyo Klîmenso gotina te

Leşkerkêşê îngilîzî kanî

Soza ko te gotî **ja** ra kanî

Rastgirê cihan Emîl Bûdicû?

Guftara te gotibû çî rast çû

Bêje tu bizişkiye çî daro

Dermanê nesaxiya me ya ro

Yekîtî ji me re çî xweş îlac e

Yat bûn di me de çî bêrewac e

Ey kurdê çiyayê deşt û zozan

Umîdê mekin ji destegîran

Encam

Bê guman, pîrozbûna mewlûdan, ji evîna pêxember pêk tîn. Ev pîrozbûn ji dema dewleta Fatimîyan di sedsala 10'an de destpê kirîye.² Zavayê Selaheddînê Eyyûbî, Muzaferuddîn Gokbori (m. 1232), merasîmen mewlûde li Îran, Anatoliya û Sûriyeye belav kiriye.³

² Selami Bakırcı, *Mevlid Doğuşu Ve Gelişmesi*, Akademik Araştırmalar Yayınları, İstanbul 2003, ss.9–14.

³ Ateş, *jedera bere*, r.7 s

Mewluda Yekemîn, ji alî îbnul cevzî ve bi erebî hatîye nivîsandin.⁴ Di nav Ereban de mewlûdên herî peşketî û baş ten zanîn û ten bikaranîn du heb in.

Yek jê, Mewluda îbn Hecer el Heytemî (m. 974) ya bi nave En-Nî'metul Kubra 'elel Âlem fî Mewlidi Seyyîdî Veleî Âdem' e, ya din jî Mewluda Berzencîye. Sê cure mewlûd hene.

Yek ji wan mewlûden helbestkî ne. Ev mewlûd bi tevahî bi Têşeya helbestê hatine nivîsandin û ji malikan pêk tên. Ya din mewlûdên pexşanî ne. Ev cure mewlûd weke nesrê hatine nivîsandin.

Piranî di zimanê erebî de ev cure mewlûd hatine nivîsandin. Ya seyemîn jîdîsa bi piranî di mewlûden erebî de hatine nivîsandin û pexşanî û helbest bi hev re hatiye bikaranîn.⁵

Melayê Jaba der heqê Melayê Bateyî gotiye:

Şahirê siyê jî Melayê Bate ye. Navê wî jî Mela Ehmed e. Eslê wî ji Bate ye. Bate gundek e, ji gundê di Hekariyan.

Di tarîxa heşt sed û bistî da peyda bûye, û zehf şîhir û ebyat gotine. Dîwaneke mexsûs heye, qewî qenc e, û mewlûdeke kurmancî gotiye.

Di welatê de ew meqbûl e; û heştê salî êmir kiriye û neh sedê hicrî merhûm bûye. Di nêv gundê Bate de jî medfûn e.

Li gora tiştê ko min bihîstiye Bate li Behdînan û li nîzingî Amediyê ye.

Ji eserên Batê min bi tenê mewlûda wî dîtiye. Herçî dîwan û şîhirên wî ne, çavên min bi wan ne ketiye. Mewlûda wî di sala 1905an de li Misrê hate çap kirin.

Heke ez ne şaş im ew mewlûd di sala 1919an de û Stenbolê jî ketiye çapê. Bi min re nisxeke destnivîs heye. Eve çend dûrik ji mewlûda Batê:

Hemdê bêhed ko Xudayê alemîn

Wî Xudayî daye me dînê mibîn

⁴ <http://www.turkcebilgi.com/ansiklopedi/mevrit>

⁵ Mehmet Zahir Ertekin, Di Edebiyata Me De Mewlud U Danberheva Mewluden Peşin En Kurdi U Tirki, Gotaren Konferansa Kurdolojiye, Zaningeha Hakkariye, 2011, R.124

Mele Bateyî'nin Mevlidi

Em kirîne imeta xeyrel beşer

Tabihî wî miqtedayê namwer

Wî Xudayî malikê milkê ezim

Daye me mîras Qurana Kerîm

Bo cemihî mislimîn û salihe

Bo feqirê Bate jî el-Fatihe

Çavkanî

Ahmet Ateş, Vesiletu'n- Necat Mevlîdi, Capxaneyê Saziya Dîroka tirkî, Ankara, 1984.

Ansîklopediya îslame, Benda Mewlde, Wesanxaneyê Wezaretê Perwerdehiyê, C8, Ankara, 1997.

Bedirxan, Celadet "Zare Dumilû Mewluda 'Usman EfenedV Hawar, Hej: 23,16Tîrmeh Şam (Cilda yekem a Haware, Wesanen Nûdem)1933

Babe Zerevanî, Mela Hisene Bateyî, Nûbihar Dergisi, sayı: 87-88, 2002-2003.

Doskî, Tahsîn Îbrahim-Doskî, Muhsîn Îbrahim, 1996. Mela-yî Bateî We Behremî-yî wî, Çaphâne-iHawar, Dohuk-Irak.

Malmîsanij, Ehmede Xasî, "Mewlide Nebî", Hevî: Kovara Çandî ya Giştî, No: 4, îlon- Parîs, 1985.

Mehmet Süreyya, Sicîllî Osmanî (Osmanlı Ünlüleri), Wesanxaneyê Yurde Weqfa Dîroke, C5, Stenbol, 1996,

Mela Mehemedê Muradan; 'Ez Ina ze yew Mûsîbetek Vinena'; Roportajkerdoxs: W.K Mer-dimin-N. Celalî, Kovara Vateyî, Stenbol, 2003.

Mela Kamle Puexî; MewlidîNebî, Kovara Vateyî, nr.19, Stockholm 2003.

Molla Hasan El-Ertûşî, 1327. Mevlidu'n-Nebî(SAV), Seyyid Şefik Arvâsî neşri, Ahmed Kâmilmatbaası, Dersâdet

M. Zeki Pakalin, Osmanlı Tarih Deyimleri ve Terimleri Sözlüğü, Wesanxaneyâ Wezaretâ Perwerdehiye ya Netew, C.2, Stenbol, 1993.

Necla Pekolcay, Mevlîd, Süleyman Çelebî, Wesanxaneyâ Dergâh, Stenbol, 1980, M. Edip Çağmar, Edebi Açıdan Arapça Mevlidler, Wesanxaneyâ îlahiyat, Capxaneyâ Özkan, Ankara, 2004.

İbrahim Agâh Çubukçu, Makaleler (Dinimizde Mevlidin Önemi), Wesanxaneyâ Zanîngeha Ankara, Fakulteya İlahiyata, Ankara, 1984,